

Berlin, di 10. 1. 1992 de

Z I N E T A Z I M A N Î D I N A V A H E R E M Ê N

K U R D Î D E

Kurd di nava hin jimarên Welatên Rojhilata Nêzîk de hatine belav kirin û ew dirêjbûneke zincîriyî mîna komekekê ji Xelkên bihev re pêktinin. Cihên, ku Kurd têde rûdinin, bi pîrbûna xwe çiyayî ne û sînorên wan di nava Îranê, Turkiyê, Îraqê û Suryê de dikevin, her wehajî topraxa wan nêzîka (500. hezar Km Çargoşî derdikeve. Ew bi vî rengê hanê di nava Dewletên jorî de li gora topraxê de tête parvekirin:

Li Turkiyê nêzîka 230. hezar Km. Çargoşî
Li Îranê nêzîka 160. hezar Km. Çargoşî
Li Îraqê nêzîka 75. hezar Km. Çargoşî
Li Suryê nêzîka 15. hezar Km. Çargoşî

Serjimara Kurdiyî giştî li gora kaniyên Biyaniyî sala 1980 de (15 - 16) Milyon Kes derdikeve. Ew bi vî rengê hanê têtin belavkirin:

Li Turkiyê 7.637 hezar Kes.
Li Îranê 5.933 hezar Kes.
Li Îraqê 2.570 hezar Kes.
Li Suryê 0.500 hezar Kes.

Ev jimarên hanê beramberî jimarên (her wehajî texmînên) di çapemeniyên Sovyêtîyî sala 1977 de cudadibin, ku ew dibêjin: Serjimara Kurdayî giştî 8. Milyon Kes dike:

Li Turkî 2 Milyon Kes
Li Îranê 3,2 Milyon Kes
Li Îraqê 2 Milyon Kes
Li Suryê 0,45 Milyon Kes.

Li wan welatên gotî de Kurd mîna Kêmitîyeke Rehî (Milî) tête danin, ewanan endazên ji sedê tên didin pêkanîn:

Li Turkiyê 21,5 % ji tevaya Xelkê,
Li Îranê 18,3 % ji tevaya Xelkê,
Li Îraqê 27,5 % ji tevaya Xelkê,
Li Suryê 9 % ji tevaya Xelkê.

Her wehajî piraniya pir ji Kurdan Musulmanê Sunî ne û li ser rêça Safiî ne. Li gora bîr û baweriya Zanevanên zimanan de hiç gûman têde niye, ku zimanê Kurdî zimanekî azadî serbixwe ye, lêbelê ji ber zînetî zimên, ya ku ew li Kurdistanê de heye, ev pîrsiyariya hanê girngbûneke zor gewre werdigre; jiber bi serxwebûna zimanê Kurdî pê rûniştin û biryardan -weke pir Nivîsvanan daye xuyanîkirin - yanî di encam dawî de bi Miletêkî tête rûniştin, ku ew ji aliyê Rehêve ji yên Serdarên wan welatan tête cudakirin. Ji ber vê yeka hanê jî em di pêşîya rengan de ji bona hilandina Kurdan - (gerjî pêşîyên wehajî bêtin dîtin) bi wergirtina pêrabûnan dijî zimanê Kurdî dibînin. Zimanê Kurdî - Hîndo Ewropî ye, xwe bi koma jorî - Rojavayî ji koma Îranî vedighîne, û beramberî zimanên Mîrîyê Dewletê di wan Welatan de, yên ku wan Kurd di nava wan de tên belavkirin, zimanê Kurdî bes û bi tenê bi nêzîkî ji zimanê Farisê didin danin, ya ku ew xwe ji desteyê jêrî- Rojavayî ji koma Îranî dide danin. Zimanê Kurdî ji bona sê zaravayên pir nêzîkî hev tête beşkirin:

1. Zaravayê Jorî: (Kurmancî).

Berlin, di 10. 1. 1992 de

Z I N E T A Z I M A N I D I N A V A H E R E M Ê N

K U R D Î D E

Kurd di nava hin jimarên Welatên Rojhilata Nêzîk de hatine belav kirin û ew dirêjbûneke zincîriyî mîna komekekê ji Xelkên bihev re pêktinin. Cihên, ku Kurd têde rûdinin, bi pîrbûna xwe çiyayî ne û sînorên wan di nava Iranê, Turkiyê, Iraqê û Suryê de dikevin, her wehajî topraxa wan nêzîka (500. hezar Km Çargoşî derdikeve. Ew bi vî rengê hanê di nava Dewletên jorî de li gora topraxê de tête parvekirin:

Li Turkiyê nêzîka 230. hezar Km. Çargoşî
Li Iranê nêzîka 160. hezar Km. Çargoşî
Li Iraqê nêzîka 75. hezar Km. Çargoşî
Li Suryê nêzîka 15. hezar Km. Çargoşî

Serjimara Kurdiyî giştî li gora kaniyên Biyanîyî sala 1980 de (15 - 16) Milyon Kes derdikeve. Ew bi vî rengê hanê têtin belavkirin:

Li Turkiyê 7.637 hezar Kes.
Li Iranê 5.933 hezar Kes.
Li Iraqê 2.570 hezar Kes.
Li Suryê 0.500 hezar Kes.

Ev jimarên hanê beramberî jimarên (her wehajî texmînen) di çapemeniyên Sovyêtîyî sala 1977 de cudadibin, ku ew dibêjin: Serjimara Kurdayî giştî 8. Milyon Kes dike:

Li Turkî 2 Milyon Kes
Li Iranê 3,2 Milyon Kes
Li Iraqê 2 Milyon Kes
Li Suryê 0,45 Milyon Kes.

Li wan welatên gotî de Kurd mîna Kêmitîyeke Rehî (Milî) tête danin, ewanan endazên ji sedê tên didin pêkanîn:

Li Turkiyê 21,5 % ji tevaya Xelkê,
Li Iranê 18,3 % ji tevaya Xelkê,
Li Iraqê 27,5 % ji tevaya Xelkê,
Li Suryê 9 % ji tevaya Xelkê.

Her wehajî piraniya pir ji Kurdan Musulmanê Sunî ne û li ser rêça Safîî ne. Li gora bîr û baweriya Zanevanên zimanan de hiç gûman têde niye, ku zimanê Kurdî zimanekî azadî serbixwe ye, lêbelê ji ber zînetî zimên, ya ku ew li Kurdistanê de heye, ev pirsîyariya hanê girngbûneke zor gewre werdigre; jiber bi serxwebûna zimanê Kurdî pê rûniştin û biryardan -weke pir Nivîsvanan daye xuyanîkirin - yanî di encam dawî de bi Miletêkî tête rûniştin, ku ew ji aliyê Rehêve ji yên Serdarên wan welatan tête cudakirin. Ji ber vê yeka hanê jî em di pêşîya rengan de ji bona hilandina Kurdan - (gerjî pêşîyên wehajî bêtin dîtin) bi wergirtina pêrabûnan dijî zimanê Kurdî dibînin. Zimanê Kurdî - Hîndo Ewropî ye, xwe bi koma jorî - Rojavayî ji koma Iranî vedighîne, û beramberî zimanên Mîrîyê Dewletê di wan Welatan de, yên ku wan Kurd di nava wan de tên belavkirin, zimanê Kurdî bes û bi tenê bi nêzîkî ji zimanê Farisê didin danin, ya ku ew xwe ji desteyê jêrî- Rojavayî ji koma Iranî dide danin. Zimanê Kurdî ji bona sê zaravayên pir nêzîkî hev tête beşkirin:

1. Zaravayê Jorî: (Kurmancî).

2. Zaravayê navînî: (Soranî).

3. Zaravayê Jêrî.

Nêzîka 2/3 ji Kurdan bi zaravayê kurmancî diaxivin. Weha tevaya Kurdên Turkiyê, Suriyê, 1/3 ji Kurdên İraqê û beşek ji Kurdên İfranê pê tên axivtin. Zaravayê Soranî nêzîka 2/3 ji Kurdên İraqê û piraniya Kurdên İfranê pê diaxivin. Zaravayê Jêrî, ya ku ew bi pir navan têtê navkirin, Kurdên İraqî li hindamên Xaneqînê de û yên İfranê li hindamên Bextiyar û Kerminşah de pê diaxivin. Zimanê Kurdî ji aliyê wêje de du reng wergirtî ye, yê ku ew xwe bi renekî bingehî li ser zaravayê Kurmancî û yê Soranî de bingeh dike.

Wêjeya Kurdîyî nivîsandî bi zaravayê Kurmancî ji sedsalên çardehan de hatiye derketin. Lêbelê wêjeya Kurdî bi Soranî ji sedsalên hevdehan de hate derketin. Di deh salên dawî (ji sedsalên bistan de) rola wêjeya Kurd bi zaravayê Soranî her û her bêtir dibû, tevî ku yên bi vî zaravayê hanê diaxivin, 1/3 ji tevaya Kurd pêktînin. Lêbelê ev rastiya hanê bi bajarê Suleymanîyê ve girêdayî bû; -jiber Xelkên wê bi zaravayê Soranî diaxivin- û ew ji wê çaxê de rola bingehî di pêşvexistina Kurdan ji aliyê siyasî û zanyarî de dilîze. Di vî babetî de bes divê bête gotin, ku 90 % ji çapeminiyên Kurdî bi zaravayê Soranî hatine nivîsandin û li İraqê de ew hatine derketin. Ji aliyê din de di welatên dinî mayî de, ku di wan de piraniya Kurdan dijîn - (ew bi zaravayê Kurmancî diaxivin), her derkirinek ji wêjeyan bi zimanê Kurdî hatiye qedexekirin.

Kurd du rengên Tîpên nivîsandinê bikar tînin: 1. Rengek bi renekî bingehî li ser tîpên Erebbî - Soranî - de têtê bingehkirin û bi derbasbûna demê re ew tîpên han xwe li gora peyvîna zimanê Kurdî de dane kirin.

2. Rengê din - Kurmancî - xwe li ser tîpên latinîyî Turkî ligel pêvekirina hin ji nîşanên taybetî de xwe dide bingehkirin û ev şeweyê hanê di destpêkirana Salên Sîyan de hate danin û li Suryê û Turkiyê de pê tê bikaranin. Weha bi wan hin ji wêjeyên Kurmancî hatin derkirin.

Z I M A N Ê K U R D Î L I T U R K I Y Ê D E

Nêzîka nivê Kurdan li Turkiyê de dijîn, ewanan li wê derê de beramberî dujwartirîn rengên zordariyê dibin. Ev rengê zordariya hanê ji dema Osmanî û tanî piştî bi cihkirina Serdariya komarî jî hêjî têtê dirêjkirin. Di vê dema meyî niha de Milîvanên Turkî hebûna Kurd mîna Miltekî serbixwe nayîn dikin. Weha ew wan bi (Turkên Çiyayî) bi navdikin. Her wehajî tanî demeke ne dûr her jêhatbûnek siyasî ji bona liberxwedanê ji bona Mafeyê Miliyî Kurd bi darvekirinê dihate gunehbarkirin.

Li ser peyvekê de bi tenha bi zimadê Dê li Heremên Kurdî de dihata tawanbarkirin. Her wehajî pêrejî derxistina Rojnaman û Kovaran, yanjî nivîstokan bi Zimanê Kurdî hatibû qedexekirin. Bi xwe jî nameyên taybetî jî nivîsandina wan bi Kurdî hatibûn qedexekirin. Nivîsandin û derkirina nivîstokên dibustanê, anîna wan ji bona welêt, wergirtina wan ji derve, xwendin yaxud hılanîna wêjeya Kurdî bi zimanê Kurdî jî hatibû qedexekirin. Çapkirin bi zimanê Kurdî bi zindankirinê têtê tawanbarkirin. Di nivên salên şêstî de Nivîsarê Kurd (Bozarşan) di karîbû nivîstokeke xwendinê ji bona (destpêkirinê) bi zimanê Kurdî li İstenbolê de di sala 1968 de bide çapkirin, ya ku wî bi destên xwe dabû nivîsandin. Xweser piştî derketina nivîstokê dadgehê li İstenbol û -Diyarbakirê de (ya ku ew bi renekî ne Mîrî mîna navîna Kurdistana Turkiyê têtê danin) - nivîstok li tevaya erdên Turkî de ji qanûnê der hate danin. Her wehajî ligel jî Nivîsar bi perçekirina Turkiyê û bi pêkanîna Dewleteke kurdiyî Serbixwe hate gunehbarkirin.

Politîka Serdarên Turkan ya li ducûyî de li Heremên Kurdî de bi eşkere vehelandina Kurd dide armanckirin; jiber vê jî xwendin bi zimanê Kurdî qedexe ye. Bes û bi tenha Xwendin li van heremên hanê de divê bi Zimanê Turkî bête kirin. Ji vî karê hanê ne bes dujwarbûna xwendinê ji Zarokên

Kurdan re têtê derketin, yê n ku ew hîç bi Zimanê Turkî tanî ketina wanî dibustanê nizanin; her wehajî pêrejî nizimbûna endaz di kêra xwendinê de têtê derketin. Weha divê li vir de bête diyarkirin, ku piraniya Mamostan di dibustanan de Turkin û ew bi zimanê Kurdî nizanin, gerjî Mamostên Kurd bêtin dîtin, fêrkirin bi Zimanê kurdî li ser wan têtê qedexekirin. Siyaseta hilandinê di warê fêrkinê de ligel bikaranîna cudayî de di navbera Zimanê Dê de û Zimanê fêrkinê de ligel siyaseta Serdarên nawendî de bi regekî giştî tê lihevkerin; jiber nêt û mebest di pêşîya pêşî de ne hiştina belavkirina xwendinê di nava Kurdan de ye. Li ser vê yekê jî de endazê jêrbûna zanebûnê şeweyê jînê di nava Kurd û Malên wan de ber bi perîşanyê ve dide kişandin. Weha zarokên kurd neçar dibin, ku ew ji dilva xwendinê di şandinyê de yaxud di şivanyê de karbikin. Tevaya van hoyên bi hev re hiştin, ku endazê Nexwendewaryê li Kurdistana Turkî de di navbera 79/95 % bête ditîn; tevî ku enadzê Nexwendewariyê li hemû Heremên Turkî dinî mayî de 49 % têtê dîtin.

Siyaseta nabûdkirina Reha Kurdî hêjî di Destgehên Xwendina Bilind de her û her li ser de têtê çûyin. Weha li ser Xwendevanên Kurd de bes û bi tenha peyivandin bi zimanê Turkî têtê zorkirin; tevî ku Destûra Turkî dide nivîsandin: ku(Hiç li Turkiyê Milettek niye, ku li ser wî Rehperestî yanjî Sitemkarî têtê kirin). Ji ber vê yekêjî qedexekirina resmî bi peyivandê bi Kurdî di warên Civakiyî giştî de jêre tê gotin, ku evaya bi xwe sergirtina zimanê Turkî di ser Zimanên din re dide derxistin. Bi regekî giştî hin pêrabûnên cuda li vir û derahanê de ji xistina Zimanê kurdî di nava jîna giştî de hatin derketin, ger ew jî demî jî bûn; jiber hin çaran jî pêwîst dibûn, ku agehdarî û nûçeyên giştî - (ji vê deqê bi xwe jî) ji bil Turkî bi serdejî bi zimanê Kurdî dihatin diyarkirin.

Her wehajî diyare, ku derkirina kovarek Mehane li Istenbolê de bi zimanê Turkî û Kurdî-(Kovara Dicle û Furat-ji Oktobera sala 1962 de tanî Avdara sala 1963 de jê heşt jimar hatin derketin). Her wehajî Kovara (Deng) di sala 1963 de hate derketin, lê dawîya wê ne diyare. Wehajî (Dengê Taze) sala 1963 de hate derketin û bes bi tenha jê sê jimar derketin. Hîç gûman tede niye, ku ev çapemeniyên hanê li ser karên pêrabûnên Serdarên Turk beramberî wan ji derketinê hatin rawestandin.

Lêbelê divê bête gotin, ku ev pêrabûnên Serdarên Turkan dibe bikaribin, karê pêşvexistina Zimanê kurdî, her wehajî pêşvexistina siyasîyî Kurdên Turkiyê bi giştî bidin bi paşvexistin, lêbelê bi her awayekî ev wan bi wan encaman nadin gihastin, yê n ku li ber çavên xwe Serdarên Turkan dane danîn; jiber tev li van pêrabûnên dujwar de ji bal Serdarên Turk Zimanê Kurdî bi regekî xurt pêşveçûna xwe û parastina cihê xwe ji xwe re dide girawkirin. Ev tabluwa hanê ber û dûrbûna bi karanîna Kurdên Turkiyê Zimanê Kurdî û yê Turkî dide diyarkirin - (bi regekî Endazî) -:

	Zimanê Kurdî	Zimanê Turkî
Dibustan	-	**
Rojname	-	100 %
Nivîstok	-	94 %
Namekarî	-	99 %
Mizgeft	2	-
Telivizyon	-	99 %
Peyivandin di		
Destgehê Mîrî de	5	95 %
Radyo	20	78 %
Civîn	88	8 %
Di kar de	84	10 %
Li qehwe xanê de	82	15 %
Li bazarê de	80	10 %
Ligel Dostan	87	3 %
Ligel Zarokan û		
Jîndarên din	97	-

Ev agehdariyên di vê tabluwa hanê de ji amara li heremekê de li Rojhilat Turkiyê de (Tor Abidîn) hatine wergirtin. Hiç guman têde niye, ku her wehajî Heremên din jî ji Kurdistana Turkiyê nemîna vê Herêmê ne. Her wehajî Partiya Demokartî Kurdistan li Turkiyê de di nava erkên xweyî bingehî de pirsyariya wergirtina pêrûniştina Mîrî bi zimanê Kurdî li Kuristanê ji bona hilanîna Nexwendewariyê, kirina xwendina Berpêşiyê erk li ser tevaya zarokan li ser xwe daniye. Her wehajî ji bona Zimanê Kurdî wêjeyî, yê ku ew tanî dema meyî nihajî bi rengêkî pir xurt lê hatiye zordarîkirin, divê ku ew bi kurttirîn dem li tevaya Kurdistanê de, li Destgehên Zanistiyê de, di Çapemenyê de, yanî ji bona bi karanîna wîna di tevaya berên jîna civakî de û ji bona pêşvexistina wîyî ayindî de bête bikaranîn û belavkirin.

Z I M A N Ê K U R D I L I İ R A Q Ê De

Li İraqê Kurd bi hersê zaravayên Kurdî di peyivin: Li jor, li Behdînan (li Heremên Akrê, Dihokê, Amêdiyê û Zaxo) de Kurd bi Kurmancî di axivin. Li Sulêmaniyê, Hewlêrê, Kerkûkê û Rewanduzê de Kurd bi zaravayê Soranî dipeyivin. Li Xaneqîn û Mendelî de Kurd bi zaravayê jêrî diştexilin. Lêbelê rengêkî giştî zîneta Kurd û Zimanê Kurdî li İraqê de ji zîneta wanî li Turkiyê de yanjî ji yên li Suryê de tête cudakirin. Tevî ku Kurd ji bona pêrûniştinê bi Mafeyê xweyî milî duçarî xebatê bûne, weha li vir de zîneta wan ji aliyê Rehê de (Necatî de) ne cihê pirsê ye, wehajî hêjî bi serdejî bi destpêkirina sedsalên niha de Kurdistana İraqê beramberî tevgera Civakî û Zanyariya Kurdî cêhê bêtirî jêhatîyî nawendî bûye. Bi rengêkî taybetî Bajarê Sulêmaniyê ji sala 1920 de - (ligel derketina Rojname Pêşkewtin) de ev cihê hanê ji xwe re dayite wergirtin. Weha di piştê jî de Bexdad û Hewlêr jî cêhê navînîyî serekî ji bona Çapemeniyên Ferhengîyî Kurdistanî ji xwe re dane wergirtin. Lêbelê piştî hîmkirina Serdariya komarî di sala 1958 de rewşa Kurdan bi beramberkirina wê ligel rojên Serdariya patîşahiya Haşimî de hate başkirin; ji ber ku xwendin di dibustanan de bes bi zimanê Erebbî bû. Lêbelê piştî wergerandina Dewletê di sala 1963 de pêrabûnên regez perestî beramberî Kurdan hatin bicihanîn û wan çapemenî û belavokên bi zimanê Kurdî jî dane berkirin. Paş hatina basiyan li ser Desthilatîya İraqê de di sala 1968 de hin yasa û pêrabûn hatin kirin, ku wan Mafeyê parastinê li ser Zimanê Kurdî û Ferhenga Kurd de dan xuyanikirin.

Her wehajî di encama peymanê 11. Avara sala 1970 de Zimanê kurdî mîna Zimenekî Mîrî li tevaya wan Hereman de, yên ku ew bi pîrbûnê Kurd bûn, hate danin. Her wehajî pêrejî ew mîna Zimanê Mîrî ji bona xwendinê li Kurdistana İraqê de hate danin. Lêbelê ligel erkirina xwendinê bi zimanê Erebbî jî li wan Hereman dejî hate danîn. wisajî Zimanê kurdî li Heremên dinî İraqê jî de mîna Zimanê duwem hate danîn.

Li Sulêmaniyê de nawendiya tevgera siyasî û Ferhenga Kurdî li Kurdistana İraqê de Zanistgeh hate vekirin. Li Bexdadê de Akadimiya Zanistiya Kurdî hate pêkhatin. Wetovjî beşekî taybetî ji bona Xwendevanên Kurdan li Fakultêta Wêjeyî li Zanistgeha Bexdê de hate vekirin. Yekitîya Nivîsarên Kurd hate pêkanîn - Kovara wê (Nuwîsarê Kurd) di hate derkirin.

Wilo bi vî rengê Kurdan azadiyeke bêtir ji bona çapkirinê bi destên xwe ve xistin. - (Di nava sala 1970 de 11. Rojname û Kovar di bin navên cuda de hatin derketin) -. Ji sala 1971 - 1972 de 8. Rojname û Kovar hatin derketin. Her wehajî Televizyona Kerkûkê Bernameyên nuh bi zimanê kurdî dest bi dawegandina wan date kirin. Lêbelê jî tev li van hemû pêrabûnên hanê jî de pirsyariya Ziman û Ferhenga Kurdî li İraqê de nehate çarekirin; him ji ber dibe, ku ew pêrabûnên hanê têr nedikirin, yanjî

dibe, ku ew di warê rastiyê de bi rengî lidûhevî nedihate bicihanîn. Tevî ku Kurdistana İraqê regekî ji Ewtonomî wergirtî ye, lêbelê jî wê tevaya Heremên Kurdistanê nedaye berkirin. Ji aliyekî din vê Ewtonomiya hanê bi regekê têr tevaya wan hêviyên, yê ku ew liser hatibûn girêdan, bicih nanîn. Delîl li ser vê yeka hanê de tevaya wan tiştên, ku kovara mehane (Monthly Review) a sala 1980 de dibêje: - (Erebkirinê dibustan û destgehên Kurdî li Heremên kurdî de ber xwe ve dane. Di sala 1977 de xwendin bi Zimanê Kurdî li Behdînan (zaxo, Emadîyê, Dihok û Akrê)de , li Kerkûk û xaneqînê de hate hilanin û di pişt re jî vê hilanîna hanê ji bona xwendinê bi Zimanê kurdî hin ji Bajarên Sulêmaniyê û Kuwêsinceqê jî bi ber xwe vekir. Li vê derê jî de divê bête gotin, ku Xwendevanên qonaxa Xwendina Navînê ducaran li dibustanên Kurdî de bermabrî bi yên Erebi kêmترین bûn. Her wehaji ligel jî Xwendvanên Kurdan di destgehên bilindî Dewletê de ji 7 der sed % kêmترین. Zanistgeha Sulêmaniyê, ya ku ew di sala 1968 de hate vekirin, ya ku divabû ew bi deqa pêşvexistinê ji bona Ferhenga Kurdî bibe, ew di sala 1981 de ji bona Hewlêrê hate veguhestin û di pişt re ew ji bona kerkûkê hate veguhestin. Di nava van salên dawî de jimara Xwendvanên Ereb yanji Xwendevanên ji Welatên dinî Erebi her û her tede tèn pirkirin.

Ji bilvê jî Xwendevanên Kurd li ser mercên wergirtina di van Destgehan de ne kêfxweşin. Ew xwe beramberî helbijartina Şaxan bi xweji zorlêkirî dibînin. Eger ew jî di hin şaxan de jî bêtin wergirtin, ew ji bona Şaxên Zanistiyên Civakê têtin wertgirtin.

Lê Akadimiya Zanistiya Kurdî, ya ku ew ji bal Dewletê hatiye destûrkirin û wê bi karê xwe bi jêhatî û bi sûd di pir beran de date destpêkirin, di nava wan beran de jî Têgihstînen Zanistiyî Kurdî hatin danin, niha di vê dema me de ew nema mîna Destgehekî Zanistiyî tete jimartin, lêbelê ew bi beşekî ji Akadimiya Zanistiyî İraqê hate veguhertin. Derbarê Nexwendewariyê li Kurdistana İraqê de -(li gora amara, ya ku ew di sala 1980 de hatiye belavkirin):

73 der % Li Kurdistan İraqê de û jê
90 der % li Heremên Çandinyê de,
99 der % di nav Cotkaran de heye.

Z I M A N Ê K U R D Î L I İ R A N Ê D E

Li İranê mîna li İraqê de Zimanê Kurdî bi her sê zaravan tete bikaranîn: Kurmancî: li rojava û li jorî Rojavayî Gola Ormiyê de tete bikaranîn. Zaravayê Mukriyanî, yê ku ew bi Soranî ve dighê: Li Heremên Mehebad û Seqizê de tete bikaranin. Zarava Jêrî: Li heremên Sune, Bextiyar û Kermensah tete bikaranîn. Kurdistana İranê yek ji cihên xurtî dîji Sah di rojên Serdariya Şahî de bû; ji ber vê yeka hanê jî tevaya livandin û jêhatbûnên girêdayî bi tevgera Miliyî Kurdî ve bi regekî bê hempa dihatin qedexekirin. Derkirina Çapemenîyan (Rojname, Kovar) ji bal Kurd qedexe bû. Em bi xwe jî nizanin, bê ka çî nivîstok di wê pêla hanê de li İranê de hetine derketin, ji bil ku Zanistgeha Tebrîzê wê ji demekê û demekê hin çapemeniyên Ferhengî û Folkulorîyî Kurdîyî wergerandî ji bona Zimanê Farisî bes û bi tenha wan ronahî didîtin. Tevî ku Êzgeha Tehranê bi Zimanê Kurdî bi navê Dewleta İranê û ji bona berjewendiya wê dida dawêşandin. Tevlivê jî bi zimanê Kurdî mîna zimanê xwendî di dibustanan de bi regekî mîrî pê ne dihate rûniştin û li ser vêji de hîç bi carekê cihê gift û goyînê nebû. Êdyolociya İrana mezin li Zimanê kurdî de û her wehaji li Zimanên dinî nêzîkî Farisî de bi regekî yanji yên din mîna Zaraveyekî ji Zimanê Farsî lê dida temaşekirin,-(belê ku ew Zimanên hanê

ji bi vî rengî hanê ve bi avêtina Şahî ve di sala 1979 de û bi cihkirina berî Oldariyê li Iranê de zîneta kurdan ne hate başkirin; ji ber karîne ji bona daxwaza Ewtonomî ji aliyê Abûrî, Ferhengî û Tîştên pêve tîn girêdan ji çarekirina pirsîyariyên Zimên hîc guhpêdan û piştgirtin jêre ne hate dan, belê bi bi servajî vê ew bi tundî û bê liberketin ji bal Serdariya nawendî hate beramberkirin.

Bi rastî benda 15 ji Destûra nuhî Komara İslamî İrani dide nivîsandin: Ku " Zimanê mîrî ji bona hemû Gel ve Zimanê Farisî ye, nivîsandin bi Farisî ye, Belgeyên mîrî bi Farisî ye, Nivîskarî û nivîsandin, her wehajî nivîstok divên bi zimanê Farisî û nivîsandîna Farisî bin. Lêbelê ji bona bi karanîna zimanên cihî û yên êlî di çapemenyan de, yên rûçikên giştîyî agehdariyê hene, her wehajî xwendina wêjeyan bi wan zimanan rê pê tê dan, bi mercekî ku ew ligel zimanê Farisî de bête kirin."

Lêbelê dê çawa yê nivîsandî di Destûrê de li rastîyî de bête bicihanin, çine karên pêrabûyî ji bona bi cihanîna vîna hatin kirin? ma gelo bi rastî li wê derê de hîç pêrabûn ji bona firehkirina bikaranîna Zimanê kurdî li Iranê hatin kirin. Derxistina bir û baweriyekê li ser vê yeka hanê de pir dujwar tete dîtin; ji ber kêmbûna agehdariyan li ser zîneta Kurdistana İrani de rê nadin. Partiyên siyasiyî pêşveketî guhpêdaneke taybetî ji bona zîneta Kêmayiyên Milî didin. Her wehajî Hizba Demokratî Kurdistana İrani jî di bernamêya xwe de erk kirina xwendinê ji bona hemû zarokan, yên ku ew di bin panzdeh salî de ne, herwehajî hilanina nexwendewariyê daye bicihkirin. Her weha wê guhpêdaneke taybetî jî ji bo bipêşveexistina Zimanê kurdî û Wêjeya wî daye. Piştgirtina Nivîskaran, Hunervanan û zanevanan ew mîna xêzeke serekî ji siyaseta xwe re di warê Ferhengî de lêdide temaşekirin.

Z I M A N Ê K U R D Î L I S U R Y Ê D e

Kurd li Suryê de bi Zaravayê Kurmancî diaxivin. Ew li perçê Jorî Welêt de li Herema Cezîrê de ne, ya ku ew ji bal Turkî û İraqê tete sînorkirin û li Heremên Serê kaniyê, Kurdaxê de dijîn, yên ku ew ji bal Turkî têtin sînorkirin. Li Heremên aliyên din ji sinorên Turkiyê û her wehajî ji yên İraqê ve Kurd bi regekî ligel hevî dijîn. Wisajî di nava wan û Kurdên Surî de Mirovaniya wan bihev re heye. Zimanê kurdî li Suryê de bi mîrî pê nehatiye rûniştin. Her wehajî di dibustan û Destgehên Zanistî de pê nayête xwendin. Wisajî bi Zimanê Kurdî ne Nivîstok, Rojaname û Kovar jî têtin derketin. Hîç li wê derê de bi Zimanê Kurdî ne Dawşandineke Radyo û ne jî ya Televizyonê tete dîtin. Wehajî bi karanîna Zimanê Kurdî di Dam û Destgehên Dewletê de nav nahêlin pê bête dan.

R. L. Tisabolov

(Ev gotara hanê di Nivîstoka(Kaniya - Rojhilat, Zineta Zimanî û Siyasete Zimanî) de hatiye nivîsandin. Mosko, Sala 1986 de, Derkirina Akadimîya Zanistîya Sovyêtî, Çapxana (Nuka -(Zanistî)) Ji destnivîsa Erebi, ya ku ew ji bal Mizgîn hatiye wergerandin, wergerandina Kurdî jê hatiye kirin).

Berlin, di 17. 12. 1987 de

W E R G E R

Dr. M. S. C U M A